SPAS ji bo ku tu ji nû ve bi kar tînî!

Nordkurdiska

Her cara ku tu pakêt an jî rojnameyeka kevin ji bo vebikaranînê diavêjî tişteke mezin diqewime. Devê şûşeyeke kevin tê guhertin û dibe sominê ciwateyê. Pakêta dermanê şiştina cilan a qermiçandî dibe kantoneke xweşik a pêlavan. Rojnameya xwendî, ji xwendinê dibe rojnameyeke nû. Bi vî awayî tu di teserûfkirina mîqdarên mezin ên enerjiyê de alîkariyê dikî. Tu herwiha dikî ku madeyên xam ên xwezayê ji dewrûdaîma xwezayê dernakevin û winda nabin. Bi xêra te jîngeh qezenceke mezin bi dest dixe. Û bi vê rêyê tu jî tiştekê qezenc dikî. Her cara ku tu tiştekî ji nû ve bi kar tînî.

Pakêt û rojnameyên ku têne dewrûdaîm kirin

Hemû pakêt û rojnameyên ku têne civandin ji bo bibine pakêt an jî berhemên nû diçine tesîseke vebikaranînê. Pakêtên plastîk ên kevin, ji bendên kêmkirina deng û firçeyên şiştina firaqan bigire hete bi seqsî û kîsên plastîk, dibine gelek tiştên nû. pakêtên cam û kaxezî bi piranî dibine pakêt û embelajên nû. Pakêtên metal dikarin bibine rêhesin. Rojnameyên xwendî dikarin bibine destmalên kaxezî yên metbaxê yan jî rojnameyên nû.

Berpirsiyariya çêkeran

Hikûmetê biryar daye ku hemû şirketên ku pakêt an jî berhemên pakêtkirî çê dikin, îxraç dikin, dadigirin an jî difiroşin dê sîstemeke civandinê ji bo serfkaran saz bikin da ku ew karibin van pakêtan ji bo vebikaranînê biavêjin. Ev weke berpirsiyariya çêkeran tê bi nav kirin. Heman tişt ji bo rojname û kaxezên vebikaranînê jî lê ye. Herwiha berpirsiyariya kes û şirketên ku kaxezên rojnameyan çê dikin an jî îdxal dikin û yên ku rojnameyan çap dikin an jî îdxal dikin ji bo civandin û vebikaranîna kaxezên vebikaranînê heye. Pakêt û rojname berî hemû berheman ketine bin qaîdeya berpirsiyariya çêkeran. Çêkerên pakêt û kaxezên rojnameyan vê berpirsiyariyê bi rêya sazkirina Komkirina Pakêt û Rojnameyan (Förpacknings- och Tidningsinsamlingen, FTI) bi cih tênin û xebatên berhevkirina van bêyî armanceke qezenckirinê têne bi rê ve birin.

Stasyonên vebikaranînê

Hemû stasyonên vebikaranînê yên li Swêdê di bin berpirsiyariya FTI'yê de ne. Tu dikarî ji bo avêtina rojname û pakêtên plastîk, yên kaxezî, yên metal û yên camî yên ji bo vebikaranînê biçî van stasyonan. Eger di avahiya ku tu lê dijî de cihê komkirina rojname û pakêtan hebe tu yê van deynê wê derê. FTI bi piraniya mitehîdên ku van pakêtan dide hev te hevkariyê dike. Tê garantî kirin ku her tiştê ku tê avêtin bi heman awayî ji nû ve tê bi kar anîn.

Agahiya zêdetir

Tu dikarî li ser malpera me stasyona vebikaranînê ya nêzîkî xwe bibînî û bixwînî ka kengî tê vala kirin û paqij kirin, www.ftiab.se/hitta-atervinningsstation. Tu dikarî herwiha li vir rêberên jihevveqetandinê, fîlmên li ser vebikaranînê, şîret û agahiyên li ser xebatên me bibînî.

Tu dikarî bi rêya e-mailê info@ftiab.se an jî telefonê 0200-88 03 11 têkiliyê bi me re deynî û bersiva pirsên xwe bistînî.

Dema dor tê bermayiyên din yên weke bermayiyên gir, kompost, bermayiyên ceyranê û bermayiyên bitehlûke, berpirsiyarî dikeve ser şaredariya te.

fti FÖRPACKNINGS & TIDNINGS INSAMLINGEN

Tu wiha ji hev vediqetînî:

Hemû pakêt divê vala û bi temamî ziwa bin. Pakêtên ku ji materyalên cuda hatine çê kirin dê ji hev werine veqetandin. Eger tu nikaribî materyalên pakêtê ji hev veqetînî, kîjan materyal di pakêtê de zêdetir be tu yê pakêtê biavêjî nav vî materyalî.

PAKÊTÊN PLASTÎK

Mînak: şîşeyên plastîk, qûtiyên plastîk, satil û bîdon, torbe û kîsikên plastîk ên biçûk (bo mînak kîsên fêkî û şînayiyê yên ji dikanên xwarinê), pakêtên vedagirtinê, tûb, kîsikên chipsan û frîgolît.

Wiha bike Dev û tapeyên wan ji wan bike. Kîsê xwe yê pakêtên plastîk vala bike nava bîdona bermayiyan da ku her yek ji xwe re be. Ev ê peyre karê vebikaranînê hesantir dike.

Neavêje Berhemên plastîk ku ne pakêtên divê weke bermayiyên gir an jî bermayiyên malê yên weke mobîlya, pêlîstok û kasetên vîdeo werine veqetandin. Şîşeyên vebikaranînê li dikanên xwarinê ji bo pantkirinê têne teslîm kirin.

PAKÊTÊN KAXEZÎ

Mînak: pakêtên makarna, şîr û ava fêkî, torbeyên kaxezî, pakêtên şekirê spî, kartonên pêlavan, rûloyên kaxezên tiwaletê û karton.

Wiha bike Li hev biqulibîne û pahn bike. Pakêtên biçûk bixe nava yên mezin de da ku cihê veguhastinê kêm bibe.

Neavêje Divê tu zerfan bixî nav bermayiyên malê/bermayiyên şewitandinê. Rojname, kaxezên reklamê û kaxezên weke van biavêje bîdona rojnaneyan.

PAKÊTÊN METAL

Mînak: qûtiyên konserveyê û yên spreyan, tûb, kapsûl û devê qutiyan, qutiyên boyaxê yên ziwa.

Wiha bike Devê qûtiyên konserveyan ên tûj bi nava qûtiyê ve bitewîne. Devê tûban bi wan ve bihêle.

Neavêje Qûtiyên bi boyax û zemq biavêje nav bermayiyên bitehlûke. Xurdeyên metal, detayên VVS, tawe û berhemên din, ku ne pakêt in, biavêje nav bermayiyên gir an jî bermayiyên malê. Qûtiyên vebikaranînê li dikanên xwarinê ji bo pantkirinê têne teslîm kirin.

PAKÊTÊN CAM

Mînak: şîşe û qevenozên bireng an jî bêreng.

Wiha bike Devê wan ji wan bike û li gora materyal wan ji hev veqetîne û biavêje. Pakêtên cam ên bireng û bêreng her yekî biavêje bîdonê wan.

Neavêje Şîşeyên vebikaranînê li dikanên xwarinê ji bo pantkirinê têne teslîm kirin. Porselen, seramîk û berhemên din, ku ne pakêt in, biavêje nav bermayiyên gir an jî nav bermayiyên malê. Ampûl û lûleyên lampayan teslîmî navenda vebikaranînê ya şaredariyê bike.



ROJNAME

Mînak: rojnameyên rojane û heftiyî, kovar, katalog, kaxezên reklaman, borşûr û kaxezên nivîsandinê/xêzkirinê, kitêbên pocket.

Wiha bike Berî ku tu biavêjî kîsên plastîk û etîketên reklamê yên bi zemq ji berhemên çapkirî bike.

Neavêje Zerf û kitêbên biberg biavêje nav bermayiyên malê/bermayiyên şewitandinê. Kîsên kaxezî, karton û tiştên weke van biavêje bîdona pakêtên kaxezî.

FTI 2015 adar